 

*Dr. Sozdar Mîdî (E. Xelîl)*

*wergera ji erebî: Mustefa Reşîd*

**Xeleka Gotaran: Kurd û Îslama Siyasî**
**Xelek 34**

# 6 - Têkçûna şoreşa Xûramî û kuştina Babek

## Ketina keleha Baz:

Biserketina leşkerên xîlafetê di şerê çemê *Gilanrozê* da bi rêveberiya *Efşîn* li dijî *Babek* û leşkerên wî destpêk bû ji bo êrişkirina ser keleha *Baz* û vemirandina şoreşê. *Efşîn* bi leşkerên xwe va, bi sedema asêbûna herêmê û ji tirsa kemînên di geliyan da, bi aheste, bi sexbêrî û wiryayî ber bi kelehê va çûn. Wan alîkarî ji hêzên taybet (*Kuhbanî, Kulgur*) wergirt ji bo dagîrkirina kop û lûtkeyên çiyan, avakirina senger û çeperan; û piştgirî bi xurdemenî, çek, posat û şervanan gihand van nawendên leşkerî yên nû. Ji hêla din va sîxur û qelawûzên xwe li herêmên şoreşê belavkirin daku nûçe û agahdariyan bicivînin û propagandayê li dijî şoreşê bikin[1].

*Babek* di wê hewl û bizavê da bû ku bi avakirina kemînan û bi êrişên nagehan û ji nişkê va pêşketina leşkerên xîlafetê rawestîne. Lê belê pilanê *Efşîn*, bi berdewamkirina abloqe, tengkirina çemberê li dor kelehê, bi jihevêxistina hêz û şiyana *Xûramiyan* û bi pêşketina bi sexbêrî û wiryayî, biserket û wisa sê tabûrên leşkerê xîlafetê gihîştin ber derwazeyên kelehê. *Xûramiyan* bi qehremanî û şiyaneka bê hempa bergirî kirin, lê belê dîsa jî her ku çû leşkerên xîlafetê pêşva hatin. Gava *Babek* dît ku keleh bi temamî hat dorpêçkirin û bergirî êdî lawaz dibe, di deriyekî nehînî ra derket û çû ku bi *Efşîn* ra dan û standinê bike. Di navbera wan da geliyek hebû. *Efşîn* hêminî (emanet) pêşkêş kir heger ew xwe bispêre. *Babek* ji *Efşîn* xwast ku rojekê dem bide wî daku ew biryara xwe bide, lê belê *Efşîn* ev daxwaz nepejirand[2].

*Babek* vegeriya hundirê kelehê û şer bê rawestan berdewam bû. Leşkerên *Efşîn* derbas hundirê kelehê bûn. Ji bergiriyên kelehê 600 şervan nexwastin xwe bispêrin dijmin. *Efşîn* ferman da agirrêjên neftê (newt) ku agir berdin ser wan, wan tev avahiyên ku ew têda bûn bisotînin. Vî şerê sotandin û kavilkirinê sê rojan berdewam kir. Di wê navberê da *Babek* ji kelehê derketibû. *Efşîn* 3319 kes ji

---

[1] Al-Tabari, Dîroka Al-Tabari, 9/29 - 30.
[2] Al-Tabari, Dîroka Al-Tabari, 9/40 - 44. Ibin Al-Esir, Al-Kamel-fi Tarîx, 6/29 - 30.

*Xûramiyan* dîlgirtin û 7600 dîlên Misilmanan, di nav wan da jin û zarok, rizgarkirin. Ev bûyer di 24-ê meha tebaxê sala 222-ê goçî (837-ê z.) da pêkhat[3].

## Dîlgirtina Babek:

Piştî ku keleha Baz kete destê dijmin, *Babek* li gel herdu birayên xwe *Ebdullah* û *Mu'awiye*, dayîk û kebaniya xwe û hin xizmetkarên xwe ji kelehê bazdan. *Efşîn* tirsiya ku *Babek* here cihekî dinî asê û şoreşê ji nû va berdewam bike. Rabû hinek şervan wezîfedar kirin ku bidin pey wî. Name ji serekên wan herêman ra şandin ku *Babek* bigirin û soz da ku ewê xelatên giranbiha bide wan. Babek û yên li gel wî xwe di nav dar û beran da diparastin. Lê dîsa jî peyayên dijmin dikarîbûn *Mu'awiye*, *dayîka Babek* û *kebaniya* wî bigirin. *Babek* û birayê wî *Ebdullah* û xizmetkarê wî xwe rizgarkirin, sînorê Ermîniya derbaskirin û gihîştin wir. Demeka pêş wê, leşkerên *Efşîn* kurekî *Babek* dîlgirtibûn. *Efşîn* ji kurê *Babek* xwast ku nameyeka bi hest ji bavê xwe ra binivîsîne û jê tika bike ku xwe bispêre. Du dîlên *Xûramiyan* ev name gihandin *Babek*. Lê belê *Babek* xwespartin nepejirand û di bersiva xwe da bi zimanekî tûj kurê xwe rezîlkir ku ew li ber dijmin qels û lawaze û got ku ew ne hêja ye kurê wî be[4].

*Babek* dixwast ku xwe di Ermîniya ra bigihîne welatê Romê (Bîzans) bi hêviya ku padîşahê Romê *Theophile* alîkariya wî bike û şoreşê ji nû va berdewam bike. Berê jî bi me ra derbas bû ku *Xûramniyên* bereya Hemedanê xwe gihandibûn welatê Romê, li derdorên Dêrsim û wan dorhêlan bi cih û war bûbûn; ew jî Kurdên *Zaza* (*Dimilî*) ne. *Babek* û yên li gel wî ketin herêma rêveberê Ermenî *Sehil Bin Sinbaz* (*Sinbad*) xwediyê keleha *Şakî*. *Sehil* pêşwaziya wî kir û destê wî ramûsa. Bi dek û dubareyeka pir kone, bawerî bi wî ra çêkir ku ew herin keleha wî. *Babek* ji birayê xwe *Ebdullah* xwastibû ku ew here ba rêberekî Ermenî yî din ku jêra *Îsa Bin Stîfanûs* dihate gotin û xwediyê keleha *Kitîş* bû. *Babek* baweriya xwe bi wî anîbû. Ji ber her metirsiyeka gengaz, nedixwast ku ew û birayê xwe bi hev ra li cihekî bin[5].

*Sehil* nameyeka tijî sozên mezin û giran ji *Efşîn* wergirtibû û li hev hatibûn ku *Efşîn* bi nehînî were dervayî keleha *Sehil* û *Babek* li wir destgîr bike, da ku di pey ra *Xûramî* tolê ji *Sehil* hilnedin. *Sehil* rojekê pêşniyaz kir ku *Babek* hinekê bihna xwe vede, ji kelehê derkeve û here raw û nêçîrê. *Babek* ev pêşniyaz pejirand. Di wê navberê da *Sehil* bi du rêberên leşkerê xîlafetê ra civan dabû li wî cihê ku *Babek* wê here nêçîrê û ji wan xwastibû ku ew bi leşkerên xwe va ji çiyayan da êrişê bînin ser geliyê ku *Babek* lê bû. *Sehil* ev dek û dubare bi temamî pêkanî. Di xulekên dawî da *Babek* li vê dubareyê hay bû û piştî hate girtin dijûn bi *Sehil* dan û jêra got: Te ez bi nirxekî erzan firoştim Cihûyan (mebesta wî Misilmanan)[6].

---

3 Ibin Al-Esir, Al-Kamel-fi Tarîx, 6/37.
4 Al-Tabari, Dîroka Al-Tabari, 4/46.
5 Al-Tabari, Dîroka Al-Tabari, 9/47. Ebo Hanifa Al-Deynuri, Al-Axbar El-Tiwal, rûpel, 405.
6 Al-Tabari, Dîroka Al-Tabari, 9/50 . Ibin Al-Esir, Al-Kamel-fi Tarîx, 6/33.

Li hember vê doxmanî û îxanetê *Sehil* bû mîrê welatê xwe û welatê wî ji dayîna Cizye û Xeracê (bac, xûk, kod, tar, salane, işare, serane) hate bexşandin. Milyonek dirhem û berpiştek (qawûş) bi gewheran xemilandî dane wî. *Babek* rakişandin bajarê *Berzend*, baregeha *Efşîn* li Azerbeycanê. Ev bûyer roja 15-ê îlona sala 837-ê z. bû. Yanê, ji dema ku *Babek* ji keleha *Baz* çûbû û hate dîlkirin kêmtirî mehekê bû.

*Efşîn* bi lez nûçeya dîlkirina *Babek* gihande xelîfeyê Ebbasî *El-Mu'tesim*. Xelîfe û layangirên wî bi vê nûçeyê gelek şabûn; mizgînî şandin hemû welat û herêmên ku ser bi *Dewleta Ebbasî* bûn daku surr û heybetê ji xîlafetê ra vegerîne. Piştî ku *Babek* hate dîlgirtin, *Efşîn* ji *Îsa Bin Stîfanûs* xwast ku *Ebdullah* (birayê *Babek*) jî jêra bişîne. *Îsa* jêra şand û wisa herdu bira ketin ber destê *Efşîn*[7].

## Dadgehkirina Bebek û kuştina wî:

*Efşîn* di navbera du rêzên tabûra leşkerî da *Babek* pêşwazî kir daku mezinahî û şiyana xwe beramber *Babek* bide xuyakirin. Di pey ra ferman da ku *Babek* bibin leşkergehê. Dibêjin ku ew bi siwarî birin. Dîroknas *El-Teberî* gotiye ku dema jin û zarokên berê li ba wî dîlkirî bûn *Babek* di wê rewşê da dîtin, "*li rûyên xwe xistin, giriyan û qêriyan heya ku dengê wan bilind bû. Rabû Efşîn ji wan ra got: We diho digot ku wî em dîlkirine û hûn îro li ser wî digirîn?!. Gotin: Ew bi me ra bir rind û qenc bû*"[8].

*Efşîn* ji *Babek* pirsiya heger daxwazeka wî heye, berî ku ew wî dişîne ba xelîfeyê. *Babek* daxwaz kir ku ew destûrê bide wî, ew bi serdanî here keleha *Baz* (nawenda şoreşê). Destûra wî hate dayîn û bi parastina leşker û pêwanan di şeveka heyvron da ji payîza sala 837-an *Babek* çû kelehê; di keleha kavilkirî da, bi bêdengî û xemgînî çavên xwe gerandin. Di pey ra vegeriya û ji *Efşîn* ra got ku ti daxazên wî neman. *Efşîn* ew û birayê wî *Ebdullah* birin bajarê Samerra, nawenda xîlafetê li Îraqê[9].

Dema *Efşîn* û li gel wî *Babek* û birayê wî *Ebdullah* gihîştin Samerrayê, xelîfe *El-Mu'tesim* dixwast bi lez wî bibîne. *El-Mu'tesim* xwe becawîş kir û bi şev derket daku ew neyê naskirin; *Babek* dît û hin pirs jê kirin, bêyî ku *Babek* zanibe ew xelîfe ye. Roja din *Babek* li fîlekî siwarkirin û li nav cemawerên gel gerandin. Xelîfe ferman da ku ew bê îdamkirin (kuştin). Celladan di destpêkê da dest û lingên wî birîn. *Babek* heya ku hên destekî wî hebû xwîn li rûyê xwe dida daku rûyê wî zer nebe, bi sedema herikîna xwînê û daku yên dora wî bawernekin ew ji mirinê ditirse. Di pey ra cendekê (laşê) wî bi darekî dirêj va li aliyekî Samerra daleqandin û seriyê wî bi birayê wî *Ebdullah* ra şandin Bexdadê. Seriyê wî li Bexdadê demekê hate daleqandin û di pey ra şandin Xurasanê[10].

---

7 Al-Tabari, Dîroka Al-Tabari, 9/51.
8 Al-Tabari, Dîroka Al-Tabari, 9/50.
9 Huseyn Qasim Al-Aziz, AlBabkiye, rûpel 281.
10 Al-Tabari, Dîroka Al-Tabari, 9/53. Ibin Al-Esir, Al-Kamel-fi Tarîx, 6/36.

Li Bexdadê, li *Ebdullah* jî wek *Babek* kirin. Destên wî û lingên wî hatin birîn û li taxa *El-Rusafe* (aliyê rojhilat yê Bexdadê) li ser pirê hate xaçkirin. *Ebdullah* jî wek birayê xwe *Babek*, bi lehengî, bi tebat û hedaneka bê nimûne li ber xwe da, bêyî ku peyvekê jî bêje dema celladan dest û lingên wê dibirîn[(11)].

Ev bû dawiya yek ji şoreşên Kurdan yên here demdirêj û yên here xemgîn û trajedîk di heyamên îslamî da û dawiya rêveberekî Kurd yê here aqilmend, leheng û berxwedêr.

---

[11] Al-Tabari, Dîroka Al-Tabari, 9/53.